# Kurdish Monitoring

Platforma Çavdêriyê û Rapornivîsînê ya Mafê Bikaranîna Kurdî

## Rapora 2024an a Binpêkirinên Birêkûpêk ên Derbarê Ziman û Çanda Kurdî de li Tirkiyeyê

Q X W

KURDISH MONITORING

2025

# Derbarê Kurdish Monitoringê de

Kurdish Monitoring, ji bo li Tirkiyeyê binpêkirinên birêkûpêk ên li dijî ziman û çanda Kurdî pêk tên bişopîne, tomar bike û bi raporan wan bi raya giştî re par ve bike ava bûye û înîsîyatîfeke serbixwe ya. Platform li gorî prensîba ku dibêje pirrengiya ziman, mafekî bingehîn ê mirovan e tevdigere û li gorî vê prensîbê jî dixwaze astengiyên di qada civakî de li pêş Kurdî derdikevin raber bike, daneyan derbarê van binpêkirinan de amade bike û bi vî rengî mafparêziyê bike.

**Kar û Bar û Armancên Platformê**

**1. Berhevkirina Datayan**

Wê çavkaniyên ji raya giştî re vekirî (dokumanên fermî, biryarên dadgehan, medyaya herêmî û netewî) bişopînin û bûyerên binpêkirinê tomar bikin.

Wê hevkariyê bi saziyên civaka sivîl, parêzer û mexdûran re bike û daneyan ji qadê berhev bikin.

**2. Rapornivîsîn**

**Raporên Birêkûpêk:** Wê her ji sê û şeş mehan û salê carekê raporên berfireh amade bikin.

**Raporên Demkî:** Di rewşên awarte de yan jî dema pêşketinên gelekî girîng pêk hatin, wê bi lez û bez raporên demkî amade bikin.

**3. Mafparêzî**

Raporan wê ji saziyên mafên mirovan ên netewî û navnetewî re bişînin.

Bi şaredariyan, partiyên siyasî û medyayê re wê hevkariyê bike û hewl bide ku di mijara binpêkirinên mafê bikaranîna ziman de baldarî çêbibe.

## 4. Hevkarî

**Civaka Sivîl:** Rêxistinên mafparêz, aktivîstên zimanparêziyê, akademîsyen.

**Medya:** Çapemeniya herêmî û netewî, rojnamegerên serbixwe.

**Saziyên Navnetewî:** Raportorên Taybet ên NYyê, Konseya Ewropayê.

**Raya Giştî:** Civaka Kurdan û parazvanên mafên zimanan ên li Tirkiyeyê.

## Armanca sereke

Armanca Kurdish Monitoringê ew e ku Kurdî li Tirkiyeyê bi Destûra Bingehîn bêparastin, li qada civakî bi rengekî azad bê bikaranîn û mîrateya wê ya çandî were parastin. Di wê baweriyê de ye ku pirzimanî yek ji hîmên esasî yên demokrasiyê ye. Ji bo siberojeke ku binpêkirinên mafan tê de nebin, bi datayan dixwaze baldariyê çêbike.

## Rewşa Heyî ya Mafên Bikaranîna Zimanê Kurdî li Tirkiyeyê

**Kurdî li Tirkiyeyê rastî astengiyên yasayî û fîîlî tê.**

**Mafê Perwerdeyê:** Mafê perwerdeyê bi zimanê zikmakî nîne. Bi tenê bi dersên bijarte û bi vekirina saziyên perwerdeyê yên taybet tê sînordarkirin.

Hejmareke gelekî kêm hîndekarên Kurdî tayîn dikin.

**Çand û Huner:** Şano, konser û berhemên edebî kêfî tên qedexekirin, hunermend dibin hedef.

**Medya û Ragihandin:** Rojname, kovar û hesabên medyaya civakî yên saziyên medyayê yên bi Kurdî weşanê dikin tên sansurkirin, tên astengkirin.

**Qada Civakî:** Tabela yan jî nivîsên hişyariyê yên şaredariyan tên jêbirin; stran û govenda Kurdî weke “sûc” tên qebûlkirin. Dema parlamenter li Parlamentoyê bi Kurdî diaxivin, dengên wan tên birîn, li şûna gotinên wan ên bi kurdî, gotina “zimanekî nayê zanîn” tê nivîsandin. Li nexweşxaneyan, li cihên kar û yên mîna wan, axavtinên bi Kurdî tên astengkirin.

**Girtîgeh:** Nahêlin girtî bi Kurdî xeber bidin, dest datînin li ser name û pirtûkên wan ên bi Kurdî. Yên bi israr Kurdî bikar tînin, tên cezakirin (qedexeya hevdîtinan, qedexeya şandin û wergirtina nameyan û axaftina bi telefonê û yên mîna wan).

Ev tiştên ku tên kirin, ne li gorî Peymana Mafên Sivîlan û yên Siyasî ya Neteweyên Yekgirtî (Xala 27an) û Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (Xala 10an) û yên din in ku Tirkiye ew peyman îmze kirine.

# Destpêk

Bi salan e li Tirkiyeyê ziman û çanda Kurdî bi rêk û pêk tê astengkirin. Parastina pirzimaniyê ne tenê mafekî çandî ye, her weha yek ji standartên esasî yên mafên mirovan ên navnetewî ye. Lê li qada civakî bikaranîna Kurdî, ji ber ku li dibistanan perwerdeya bi kurdî qedexe ye, zextên yasayî û civakî li ber azadiya derbirînê ya hunerî hene bi rengekî cidî tê astengkirin. Nakokî di navbera vê rewşê û peymanên navnetewî yên Tirkiye ew îmze kirine de heye. Her weha ev rewş li ber avakirina civakeke demokratîk jî asteng e.

**Kurdish Monitoring (Platforma Çavdêriyê û Rapornivîsînê ya Mafên Bikaranîna Kurdî )**, înîsîyatîfeke serbixwe ye ku ji bo li Tirkiyeyê binpêkirinên birêkûpêk ên li dijî ziman û çanda Kurdî pêk tên bişopîne, tomar bike û bi raporan wan bi raya giştî re par ve bike ava bûye.


Ev rapora li ber destê we, di çar kategoriyên sereke de hatiye amadekirin û tê de binpêkirinên mafên bikaranîna Kurdî yên 2024an **(çand û huner, qada civakî, girtîgeh, medya)** hene. Bi van zanyariyan, zor û zextên li Tirkiyeyê li pêş bikaranîna Kurdî hene, bi nêrîneke sîstematîk diyar dike.

# Analîza Binpêkirinên Mafê Bikaranîna Çand û Zimanê Kurdî yên 2024an li Tirkiyeyê

## Rewşa Giştî

Li ser hev **109 caran maf hatine binpêkirin. Li gorî kategoriyan rewş wiha ye:**

•**Çand û Huner**: 27 bûyer
•**Qada Civakî**: 53 bûyer
•**Medya**: 11 bûyer
•**Girtîgeh**: 18 bûyer



**Analîza Kategoriyan**

1. **Binpêkirinên di Qada Çand û Hunerê de pêk hatine (27)**

**•Betalkirin/Qedexekirina Bernameyan:**

•Şaredarî û walîtiyan bêyî ku hincetan nîşan bidin şano, konser û bernameyên çandî yên bi Kurdî qedexe kirin. (Mînak: Şanoya bi navê "Qral û Travîs" li 4 bajarên cuda hate qedexekirin. Konserên Sasa Serapê 4 caran hatin betalkirin).

•Hesabên medyaya civakî yên hunermendan hatin girtin. (Rotinda).

**•Desteserkirin/Girtin:**

•Endamên Koma Hevrayê, her weha hunermend Helîm Arslan û Azad Bedran hatin girtin.

**•Lêpirsîn û Zextên Yasayî:**

•Lêpirsîn li Kasım Taşdoğan û Kazım Öz vekirin.

2. **Binpêkirinên li Qada Civakî (53)**

**•Astengiyên li Parlamentoyê derketin û yên din:**

•Li Parlamentoyê axaftinên bi Kurdî hatin astengkirin, daxwaza wergêran û perwerdeya bi zimanê zikmakî hate redkirin.

•Tabelayên bi Kurdî jê birin, nivîsa "Tirkiye ya Tirkan e" hate nivîsîn.

**•Desteserkirin/Girtin:**

•Ji ber stranên Kurdî û govendgerandinê 375 kes hatin desteserkirin, 47 kes hatin girtin.

•Karker ji ber ku bi Kurdî axivîn, ji kar hatin derxistin (Bodrum û Balafirxaneya Stenbolê).

**•Cudakariya di warê Perwerde û Tenduristiyê de:**

•Bi tenê 10 hîndekar ji bo mamostetiya Kurdî hatin tayînkirin.

•Nexweşa ku bi Tirkî nedizanîbû, nehate dermankirin (Sêrt).

•Saziyên ku perwerdeya bi Kurdî didin her tim zext li wan dibin, kesên dersên Kurdî didin her carê tên girtin an jî neçar dimînin ku dest ji kar berdin.

**•Sûcên Nefretkirinê:**

•Slogana "Jin, Jiyan, Azadi" qedexe kirin, nivîsên bi kurdî jê birin.

•Ji ber ku bi kurdî axivî, Hakîm Loqmanê ji Herêma Kurdistanê ye hate kuştin.

3. **Binpêkirinên di Medyayê de (11)**

**•Sansurkirina Internet û Weşanan:**

•Hesabên Kurdî yên Rojnameya Xwebûnê, Ajansa Mezopotamyayê û Jinnewsê hatin astengkirin.

•Hesabên medyaya civakî hatin girtin.

**•Qedeqekirina Çapemenî û Pirtûkan:**

•120 pirtûk, kovar û rojnameyên bi Kurdî û derberê Kurdan de hatin qedexekirin.

•Romana Kurdî ya Rênas Jiyan hate qedexekirin.

4. **Binpêkirinên li Girtîgehan (18)**

•**Astengkirina Mafê Ragihandinê:**

•Nehiştin ku girtî bi malbatên xwe re bi Kurdî biaxivin, dest danîn li ser nameyên bi Kurdî hatine nivîsandin.

•Dema girtî bi rêya telefonê bi Kurdî diaxivîn, telefonên wan hatin girtin. (Girtiyê kêmendam ê li Kayseriyê).

•**Ceza û Pêkanînên Dîsîplînê:**

•Cezayên xistina hicreyan dan girtiyên ku stranên Kurdî stran (Girtîgeha Şakranê û ya Êlihê).

•Ji ber ku helbest bi Kurdî nivîsandiye lêpirsîn li girtî vekirin.

•**Astengkirina Pirtûk/Materyalan:**

•Ger girtî heqdestê wergêran bidin dikarin pirtûkên Kurdî werbigrin. Dest danîn ser wergera Kurdî ya pirtûka Yaşar Kemal.

## Agahdarî

Ev zanyarî ji çavkaniyên ku ji raya giştî re vekirîne hatine berhevkirin. Ev zanyarî beşeke ji zext û zordariya li ser Kurdî nîşan didin. Mînak, li girtîgehekê dema behsa astengkirina Kurdî tê kirin, ew ne tenê ji bo girtiyekî/an jî girtiyekê ye, her weha ji bo hemû girtiyan e ku ew hemû jî ji bikaranîna mafê xwe tên bêparkirin. Her weha car caran mirov ji bo ceza nexwin, otosansurê li xwe dikin. Di mînaka komkirina 120 pirtûkan de jî, astengkirin û qedexe ne tenê li nivîskar û weşanxaneyan tên kirin, her weha ev tişt bandorê li xwendevanan jî dike. Bi hezaran kesên ku dixwazin biçin konser û şanoyan jî di heman rengî de ne. Hin bûyer hene ku di çapemeniyê de cih nagirin. Ji ber wê, ev bûyer neketine nav rapora me de jî. Lewre di nava rojê de gelek caran li ser medyaya civakî, li kolanan Kurdî rastî astengiyan tê, cudakarî li wan kesan dibe ku dema bi Kurdî diaxivin, her weha rastî nîjadperestiyê tên. Ji ber wê jî, hejmar, ji ya ku di raporê de hatiye nivîsîn, zêdetir e.

# Binpêkirinên Mafê Bikaranîna Çand û Zimanê Kurdî yên 2024an li Tirkiyeyê

Ji Çandê heta Siyasetê, ji Girtîgehan heta Medyayê: Analîza Salekê

# 1. Binpêkirinê di Qada Çand û Hunerê de Pêk Hatine

## Kanûna Paşiyê

- Şano Ar a navenda wê li Êlihê ye, bi lîstika xwe ya bi navê “Qral û Travîs” derket tûrneyê. Lîstik bêyî ku hincetekê nîşan bidin li Agiriyê hate qedexekirin.

## Sibat

- Lîstika “Qral û Travîs” a di meha Kanûna Paşiyê de li Agiriyê hate qedexekirin, di meha Sibatê de jî li çendîn bajaran hate qedexekirin. Lîstik di 10ê Sibatê de li Dîlokê, di 16ê Sibatê de li Stenbolê, di 18ê Sibatê de jî li Edeneyê hate qedexekirin. Li Stenbolê Qeymeqamiya Şîşliyê, bêyî ku hincetekê nîşan bide lîstik qedexe kir. Lîstikvan bi darê zorê ji ser dikê daxistin, nehiştin temaşevan bikevin salonê. Lîstikvan bi darê zorê ji salonê derxistin. Lîstikvanên ku li ber Navenda Çandê ya Cemîl Candaş a Şîşliyê bertek nîşanî qedexeyê dan tevî birayê lîstikvan Bahoz Özsunar hatin desteserkirin.
- Walîtiya Çewligê konsera Metîn Kemal Kahraman ya ku Şaxa Çewligê ya Sendîkaya Kedkarên Perwerde û Zanistê (Eğitim Sen) dixwest di 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê de pêk bîne, beriya konserê bi 2 saetan qedexe kir. Walîtiyê ti sedem ji bo qedexeyê nîşan neda.
- Ji ber ku li Qersê di dema Newroza 2023yan de strana “Serhildan Jiyan e” straye, lêpirsîn li stranbêj Kasım Taşdoğan vekirin.

### Adar

Walîtiya Edeneyê nehişt ku çar endamên koma muzîkê Kolettîfa Rîtmên Azad di mîtînga 8 Adarê de konserekê bidin. Walîtiyê qonser qedexe kir.

**Gulan**

- Konserên stranbêj Sasa Serapê yên di 7ê Gulanê de wê li Kayseriyê, di 20ê Gulanê de li Meletiyê, 22yê Gulanê li Mêrdînê û 25ê Gulanê li Wanê pêk bên, hatin betalkirin. Walîtiya Meletiyê nivîseke fermî ji şîrketa organîzasyonê re şand û bi vî rengî diyar bû ku konser qedexe bûye. Li Kayserî û Wanê rayedarên walîtiyan telefon kirin û bi devkî gotin ku konser qedexe bûne. Li Mêrdînê wê konser li salona konferansê ya otelekê pêk bihata. Konsera li vir jî bi hinceta "arîzeyeke teknîkî derket" hat betalkirin.
- Walîtiya Dêrsimê, konsera Kasım Taşdogan qedexe kir.

**Îlon**

- Endamên koma muzîkê Koma Hevrayê Zeynep Doğan, Gencay Morkoç û Yusuf Keleş dema ji avahiya Komeleya Lêkolînên Ziman û Çandê ya Mezotopamyayê (MED-DER) derdiketin hatin desteserkirin. Ew birin Navenda Polîsan a Amedê. Li gorî zanyariyan, hunedmend ji ber stranên xwe yên ku di dema konsera xwe ya li Qada Şêx Seîd a li Amedê strane, hatin desteserkirin. Endamên komê ji bo piştgiriyê çûbûn serdana komeleyê.
- Ji bo lêpirsînekê bangî derhênerê fîlmên Bahoz û Zer Kazım Öz kirin. Ji ber ku fîlmî wî li ser Youtube hatibû weşandin, lêpirsîn li wî hatibû vekirin.
- Hesabên medyaya civakî yên Rotînda hatin girtin.

**Çiriya Pêşiyê**

- Hunermend Helim Arslan (Omerî) û Azad Bedran Kızılkar li Amedê hatin desteserkirin. Arslan li mala xwe, Kızılkar jî li balafirxaneyê hate desteserkirin.
- Konsera hunermend Seyîdxan Sevînç a li Sêrtê hate qedexekirin. Ji bo konserê beriya konserê hunermend û Midûriyeta Perwerdeya Netewî ya Sêrtê li hev kiribû lê beriya konserê bi du rojan Walîtiya Sêrtê konser betal kir. Ji ber wê jî konser li salona Baroya Sêrtê pêk hat. Li gorî ku Sevînç ragihandiye, şîrketa organîzasyonê ji bo konsereke Tirkî serî li heman cihî daye û bersiveke erênî dane wan.

- Endamê Koma Hevrayê Gencay Morkoç piştî hate desteserkirin, hate girtin.
- Wezareta Çand û Tûrîzmê, di biryareke xwe de got ku fîlmî Rojbash, “ji bo belavkirina bazirganî ne guncav e” ango nabe li salonên sînemayan were nîşandan. Özkan Küçük çêkerê fîlm e û film behsa komeke şanogerên Kurd dike ku piştî 25 salan careke din hatin ser hev.

**Çiriya Paşiyê**

- Şaredariya Kuçukçekmeceyê ya CHPyî, konsera Rojdayê ya wê di 17ê Çiriya Paşiyê de pêk bihata, di 8ê Çiriya Paşiyê de betal kir. Şaredariyê ti hincet nîşan neda.
- Konsera Azad Bedran a wê di 15ê Kanûna Paşiyê de li Navenda Çandê ya Şaredariya Mûratpaşa a Antalyayê pêk bê, bi hinceta ku “civîneke din heye” betal kirin.
- Konserên ku hunermend Xecê wê di 16ê Çiriya Paşiyê de li Erzeromê, di 20ê Çiriya Paşiyê de li Agiriyê û di 21ê Çiriya Paşiyê de li Mûşê pêk bihatana, ji hêla xwediyên salonan ve hatin betalkirin.

**Kanûna Pêşiyê**

- Şaredariya Şîşliyê ya CHPyî, konsera Diljen Ronî ya li Navenda Çandê ya Cemîl Candaş, betal kir. Şaredariyê konser bi hinceta “tadîlat li salonê heye” ev biryar da.
- Konsera Metin Kemal Kahraman li heman cihî jî bi heman hincetê betal bû.
- Her weha konsera Murad Demîrî jî ya li heman cihî jî betal bû.

# 2. Bipêkirinên li Qada Civakî

**Kanûna Paşiyê**

- Li navçeya Alîagayê ya Îzmîrê Ferhat Çelik dema li muzîka Kurdî guhdar dikir, notirvanên taxan êrîşî wî kirin û tundkarî lê kirin. Çelik, ji bo tundkariya lê bûye, serî li Serdozgeriya Komarî ya Îzmîrê da û giliyê´notirvanan kir.
- S. Ç. Ye 80 salî dema ji Wanê bi balafirê çû Stenbolê, ji ber ku bi Tirkî nedizanîbû, li Balafirxaneya Stenbolê hate rawestandin.

**Sibat**

- Parlamentera DEM Partiyê Bêrîtan Güneş Altın di 21ê Adarê Roja Zimanê Zikmakî de li Civata Giştî a TBMMyê bi Kurdî axivî. Lê dema ew bi Kurdî axivî, dengê wê hat birîn. Altin li cihê ku lê rûniştî bû, axivî û hin gotinên bi Kurdî kirin. Ji ber ku bi Kurdî axivî, Wekîlê Serokê Parlamentoyê Celal Adan mîkrofona wê girt û got ku li gorî Destûra Bingehîn divê bi Tirkî biaxive. Altınê got ku mafê wê yê axaftinê ji wê standine.
- DEM Partî û DBPyê ji bo 21ê Adarê Roja Zimanê Kurdî û hilbijartina herêmî afîş amade kirin û xwestin li bîlbordan deynin. Lê Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê ya qeyûm tayînî wê kiribûn, destûr neda.

## Mart

- Şaredarê Bajarê Mezin ê Stenbolê Ekrem İmamoğlu, di 5ê Adarê de beşdarî bernameya Halk TVyê bû. Di dema bernameyê de li straneke Rojda guhdar kirin û İmamoğlu got ku stranê gelekî bandor li wî kir. Piştî vê bernameyê hin hesabên medyaya civakî û malperên nûçeyan îdia kirin ku ev strana bandor li İmamoğlu kiriye, “dijminatiya Tirkan” dike. Strana navborî, straneke navdar a Dengbêj Şakiro bû.
- Serokatiya Karûbarên Olî sîstema xutbeyan bi 8 zimanan (Tirkî, Ingilizî, Erebî, Almanî, Îtalyanî, Fransizî, Rûsî û Spanyolî) amade kir lê tê de Kurdî nîne.

## Nîsan

- Parlamentera DEM Partiyê Gülcan Kaçmazê li Parlamentoyê xwest ku cejna Êzidiyan "Çarşema Sor" bi Kurdî pîroz bike, lê dengê wê hate girtin.

### Gulan

- Li Amedê Pîne Kafe ya li Kolana Hunerê ya Yenîşehîrê ji ber ku xizmetên xwe bi Kurdî dida, polîsan bi ser wê de girt. Xwediyê kafeyê Ramazan Şîmşek diyar kiribû ku ji bo zimanê Kurdî winda nebe, ew ê xizmetên xwe bi Kurdî bidin. Piştî serdegirtina polîsan, Şîmşek hate desteserkirin û ji ber ku li ser hesabê kafeyê yê Instagramê stranên bi Kurdî hatine weşandin, bi tohmeta "propagandaya rêxistinê kiriye" cezayê qedexeya derketina derveyî Tirkiyeyê û derketina ji derveyî malê dane Şîmşek.
- Wezareta Perwerdeyê ya Netewî ji 20 hezar dersdêren bi tenê 10 dersdêr ji bo perwerdeya Kurdî tayîn kirin. 6 ji wan ji bo Kurmancî, 4 jî ji bo Zazakî hatine tayînkirin. Par Wezaretê ji bo heman perwerdeyê 50 dersdêr tayîn kiribûn.
- DEM Partiyê ji bo ku perwerdeya zimanê zikmakî bikeve bin misogeriya destûra bingehîn û Kurdî bibe zimanê perwerdeyê pêşniyaznameyek pêşkêşî Serokatiya Parlamentoyê kir. Lê Serokatiyê bi hinceta ku "li dijî Destûra Bingehîn e" ev pêşniyazname bi şûn de vegerand.
- Hevseroka Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê Devrîm Demîr roja 15ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî di dema civîna Meclîsa Şaredariyê de bi Kurdî axivî. Endamên Meclîsê yên AKPyî xwestin axaftina Demîrê asteng bikin.

### Tîrmeh

- Komeke ciwanan li peravên Mersînê bi stranên Kurdî govend gerandin û dîmenên xwe li ser hesabên medyaya civakî weşandin. Piştî weşandina van dîmenan, hin derdoran ew kirin hedef. Serdozgeriya Komarî lêpirsîn li 11 ciwanan vekir û biryar da ku ew bên desteserkirin. Polîsan bi ser malên ciwanan de girtin, 9 ciwan hatin desteserkirin. 2 ciwan ji ber ku ne li malên xwe bûn, nehatin desteserkirin. Polîsan dema ciwan desteser kirin û ew

birin navenda polisan strana “Ölürüm Türkiyem” (Ez ji bo Tirkiyeyê dimirim) bi ciwanan dan guhdarkirin. 9 ciwan hatin girtin.

- Li navçeyên Bagcilar, Esenyûrt, Sûltangazî û Gazîosmanpaşayê yên Stenbolê, 18 kes ji ber ku di dawet ango şahiyên zewacê de li ber stranên Kurdî govend gerandine, hatin desteserkirin. Piştî îfade dan serdozgeriyê, 11 ji wan bi îdiaya ku “propagandaya rêxistinê kirine” hatin girtin. 7 ji wan bi şertê kontrola edlî serbest bûn.
- Li Bazidê, navçeya Agiriyê polîsan bi ser şahiyeke zewacê de girt. Xwediyê salonê Ali Boran, stranbêj Şenol Aktar, birayê wî Onur Aktar û kameraman Abdullah Kebude desteser kirin. Kesên hatin desteserkirin piştî li şaxa dijterorê ya navenda polîsan îfade dan, serbest bûn.
- Polîsan li Bazidê, navçeya Agiriyê bi ser çendîn malan de girtin. Gökhan Rızaoğlu, Seyyit İbrahim Yardımcı, Okan Sekirden ve 2 kesên ku navên wan nehatin zanîn desteser kirin. Li Stenbolê jî Mutlucan Sekirden desteser kirin. Li gorî zanyariyan, her şeş kes ji ber ku du hefte berê di dema şahiyeke zewacê de cil û bergên netewî yên Kurdan li xwe kirine û li ber stranan govend gerandine, bi îdiaya ku “propagandaya rêxistinê kirine” hatin desteserkirin.
- Piştî vîdeoyeke ku li Misircê, navçeya Sêrtê di dema şahiyeke zewacê de hatiye girtin û tê de jinên govendê digerînin hebûn, li ser medyaya civakî hate belavkirin, hin bikarhênerên medyaya civakî ew jin kirin hedef. Polîsan li Êlih û Sêrtê bi ser hin malan de girtin, 6 jin desteser kirin. 3 kes hatin girtin ku xwişk bûn, dêya wan bi cezayê zindanîkirina malê hate cezakirin. Walîtiya Sêrtê daxuyaniyeke nivîskî weşand û îdia kir ku kesên di vîdeoyê de ne “propagandaya rêxistinê kirine.”
- Kesê bi navê B. S. yê li Aydinê leşker e, li navenda leşkeriyê hate desteserkirin. B. S. derxistin dadgehê û dadgehê bi îdiaya ku wî “propagandaya rêxistinê kiriye” biryara girtinê ji bo wî da. B. S. şandin girtîgehê. Li gorî zanyariyan B. S. li navçeya Stenbolê Arnavutköyê di dema şahiya çûna xwe ya leşkeriyê de stranên Kurdî straye û govend gerandiye û sedema girtina wî jî ev e. Her weha polîs li kesekî ku di nava govendgeran de bû, digerin.
- Hêzên ewlekariyê li Colemêrgê ji ber ku di dema şahiyeke zewacê de stran strîne û sloganên avêtine, pênc kes desteser kirin. Li gorî zanyariyan ev kes bi îdiaya ku

“propagandaya rêxistinê kirine” hatine desteserkirin. Piştî jêpirsîna wan, çar ji wan hatin girtin, yek ji wan serbest bû.

*Li gorî daxuyaniya Komeleya Mafên Mirovan (İHD), di 10 mehên sala 2024an de li ser hev 375 kes ji ber govend gerandine û stran strane li Êlih, Îzmîr, Riha, Mêrdîn, Amed, Şirnex, Antalya, Mêrsîn, Agirî, Sêrt, Stenbol, Colemêrg, Osmaniye û Balikesîrê hatine desteserkirin, 47 ji wan hatine girtin.

- Nivîsên “Pêşî Peya” yên ku Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê li ser rêyan nivîsîne, jê birin. Li şûna van nivîsan “Tirkiye ya tirkan e û wê ya Tirkan bimîne” nivîsandin. Paşê şaredariyên Mêrdîn, Êlih, Amed, Şirnex û navçeya Depê ya Elezîzê jî heman nivîs li ser rêya nivîsîn, lê ev nivîs jî bi heman armancê jê birin.
- Baroya Amedê ji ber jêbirina nivîsan, giliyê radeyaran kir. Baroyê di daxuyaniya xwe de got ku “Baroya me ji ber reşkirina nivîsên “Hêdî” û “Pêşî Peya” yên li Amedê li ser rêyan hatine nivîsîn, gilî kiriye.” Li gorî daxuyaniya Baroyê reşkirina van nivîsan çalakiyeke nefretkirinê û biçûkxistinê ya li dijî Kurdî ye. Wezareta Ragihandinê û Binesaziyê bersiva pirsiyarnameyeke derbarê jêbirina nivîsên navborî da û got ku Kurdî “ne li gorî standartan e.”
- Endamên Meclîsa Partiyê yên DEM Partiyê bi armanca “zindîkirina zimanan”, pêşniyarnameyek pêşkêşî Şaredariya Karakopriyê kirin û xwestin ku tabelayên bi Tirkî, Kurdî û Erebî bên daliqandin. Lê endamên Meclîsê yên AKP û YRPyê ev pêşniyarname nepejirandin.
- Çar endamên Koma Özgünê ya stranên Kurdî distirê, ji ber li Colemêrgê di dema şahiyeke zewacê de stranên “Keça Kurdan” û “Şervano” strane, bi hinceta ku “propagandaya rêxistinê kirine” hatin girtin. Kesek ji komê bi şertê kontrola edlî serbest bû.
- Bengîn ji ber ku di Newroza Giyadînê, ya navçeya Agiriyê de stranên Kurdî straye, cezayê girtîgehê lê hate birîn. Di daneşîna yekem a dozê de, ji ber stranên “Rojbaş”, “Milîtano” û “Serhildan Jiyan e”, bi îdiaya ku “propagandaya rêxistinê kiriye” salek cezayê girtîgehê lê hate birîn.

- Li ser hesabê Trabzonsporê yê fermî yê TikTokê straneke Kurdî hate parvekirin. Di vîdeoyê de lîstikvanê tîmê Enis Destan û strana rapbêjê Kurd Serhado ya bi navê “Zimanê Kurdî” hebû. Piştî bi demekê ew vîdeo jê birin.
- Wezîrê Karûbarên Hindir Alî Yerlîkaya di civîna Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê de (TBMM) behsa strana “Ölürüm Türkiye” (Ez ji bo te dimirim Tirkiye) kir û got ku kesên dibêjin “Bijî Portekîz”, ji vê stranê hez nakin û ez ji ber vê jî ne xemgîn im. Di zabitnameyan de gotina Bijî” ya Wezîr nehate nivîsandin.

**Tebax**

- Li Bodrûmê şîrketeke taybet qedexe kir ku xebatkarên wê di navbera xwe de bi Kurdî biaxivin. Digel vê rewşê jî ciwanan di axavtina Kurdî de israr kirin. Yek ji midûrên fîrmayê, di koma Whatsappê ya şîrketê de behsa mijarê kir û ciwan piştî vê rewşê bi daxwaza xwe dest ji kar berdan. Ciwan vegeriyan bajarên xwe lê ji ber ku ew ji kar derketin, heqdestên wan kêm dan wan. Ciwanan got ku ew ê giliyê şîrketê bikin.
- Mehmet Kalkan û Fatîh Aydinê di şîrketa bi navê HD İskender a li Balafirxaneya Stenbolê kar dikirin, ji ber di navbera xwe de bi Kurdî diaxivîn, mobbîng li wan bû. Karker bi hinceta ku agir bi frîtozê ketiye, ji kar hatin derxistin.
- Li Osmaniyeyê ji ber ku di dema şahiyeke zewacê de li ber stranên Kurdî govend gerandine, 5 kes hatin desteserkirin. Ji wan Hîvda Kahraman hate girtin.
- Parêzer Bermal Yildenîza ku staja xwe li Baroya Amedê kir û di dema merasîma sondxwarinê de li gel Tirkî, bi Kurdî jî sond xwar, bû hedefa hin derdoran. Yildenîzê vîdeoya xwe ya dema sonxwarinê li ser hesabê xwe yê medyaya civakî bi gotina “Pêşiyê Zimanê Kurdî” weşand û piştî wê li ser medyaya civakî hin kesan êrîşî wê kirin.
- Li ser pirsyarnameyeke derbarê xizmetên bi Kurdî de, Wezareta Tenduristiyê di bersiva xwe de behsa her çar xalên destpêkê yên Destûra Bingehîn kir û got, “Tirkiye nayê parçekirin.”
- Li navçeya Altieylül a Balikesîrê sê karkerên înşaetan ji ber ku li parkê li stranên Kurdî guhdar dikirin hatin desteserkirin. Ji karkeran Cemal Güzel bi tohmeta ku “propagandaya rêxistinê kiriye” û “li dijî polîs derketiye” hate girtin.

**Îlon**

- Polîsan bi ser Komeleya Lêkolînên Ziman û Çandê ya Mezopotamyayê (MED-DER) û Payîz Pirtûkê de girtin. Polîs 3 saetan li van her du cihan lêgerîn kirin û dest danîn li ser pirtûkên perwerdeyê û kovarên Kurdî û hard dîskan.
- Polîsan bi ser Kooperatîfa Ziman Çand û Perwerdeyê ya bi navê Ankayê de girt ku atolyeyên perwerdeyê yên pirzimanî li dar dixist. Hevserokê berê yê MED-DERê Rifat Ronî desteser kirin.
- Hemwelatiyê Herêma Kurdistanê Hakîm Lokman, li gorî îdiayekê ji ber ku bi Kurdî axiviye, ji dilê xwe hate kêrkirin û kuştin. Pismamê Lokmanê 45 salî, Ramazan Mûhammedî got “Em sedema pevçûnê baş nizanin lê 12 kedan erîşî Lokman kirine.”
- Li Sêrtê Fatma Surmeliya ku guhê wê baş nedibihîst çû nexweşxaneyê. Lê ji ber ku bi Tirkî nedizanî nehate dermankirin û testa ku fam dike bê ka çiqas deng diçe yan naçe (SRT) nehate çêkirin. Doktorê ku ew kontrol kir, di nota xwe de gotiye “Ji ber nexweşê bi Tirkî nedizanî bû, rêjeya SRTya wê nehate pîvan.” Doktor xwest ku Sumeliyê bibin nexweşxaneyeke din.
- Wekîlê Serokê KAMİADê Nedim Şimşek, derket ser ekrana Rûdawê û bi Kurdî behsa pirsgirêkên miteahîdan kir. Paşê rêveberiya Komeleyê ew şand dîsîplînê û heta pêvajoya lêpirsînê bi dawî bû ew ji wezîfeyê hate wergirtin. Serokê KAMİADê Ali Adıgüzel ji bo Rûdawê got "qaşo saziya weşanê."
- Rêxistina Dêrsimê ya DEM Partiyê dema ji bo ku namzetên şaredariyê diyar bikin, xebatên pêşhilbijartinê dimeşand, li ber stranên Kurdî govend gerandibû. 15 kes ji ber vê rewşê dihatin darizandin. Dadgehkirina wan berdewam kir.

**Çiriya Pêşiyê**

- Slogana “Jin, Jiyan, Azadî” li Amedê hate qedexekirin.
- DEM Partiyê xwest ki li Parlamentoyê kadro ji bo wergêrên Kurdî werin vekirin. Lê ev daxwaz bi dengên AKP û MHPyê nehate pejirandin.

- Ji ber ku xutbe û weaz bi Kurdî dane li endamên Komeleya Alîkarî û Piştgiriyê ya Zanyarên Olî (DİAYDER)ê vekiribûn. Di encama dadgehkirina wan de her li 12 kesan 6 sal û 3 meh, li 4 kesan 7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê birîn. Di dozê de biryara beraetê ji bo 6 kesan dan.
- Li Sêwasê li dijî kuştina jinan a di demên dawiyê de pêk hatine saziyên civaka sivîl civîneke çapemeniyê li dar xist. Di dema civînê de pankarteke bi Kurdî ya li ser wê “Jin Jiyan Azadî” hatibû nivîsandin, rastî bertekan hat.

## Çiriya Paşiyê

- Dadgehê hinceta cezayê ku li Hevserokê berê yê Komeleya Lêkolînên Kurdî Eyyüp Subaşiyî biriye aşkere kir. Li gorî biryara dadgehê, ji ber ku Subaşi bi kesên dixwazin Kurdî hîn bibin bi rêya telefonê axiviye, ew bi tohmeta “endamtiya rêxistinê” ceza kirine.
- DEM Partî ji bo ku di balafiran de xizmet bi Kurdî bê dayîn, pêşniyarnameyek pêşkêş kir. Lê ev pêşniyarname bi dengên AKP û MHPyê hate redkirin.
- Qayimê ku tayînî ser Şaredariya Êlihê kirin, nivîsa “Komplexa Werzîşê ya Jinê” ya ku Partiya Aştî û Demokrasiyê di sala 2015an de li ser navenda sporê ya jinan nivîsî bû, jê bir.
- Parlamentera DEM Partiyê Burcugül Çubuk, li Parlamentoyê, dema strana Devrim Demir, Hevşaredara Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê a qeyûm li şûna wê tayîn kirin, vekir, dengê wê hate birîn.
- Piştî qayûm tayînî ser Şaredariya Miksê ya Wanê kirin, tabela û pankartên bi kurdî yên di dema şaredarî di destê DEM Partiyê de bû hatibûn daliqandin, hatin daxistin.
- Di dema civîna derbarê Pêşniyarqanûna Budceya Rêveberiya Navendî ya sala 2025an de, li Komîsyona Plan û Budceyê ya Parlamentoyê, DEM Partiyê pêşniyarek kir û xwest ku di xizmetguzariya tenduristiyê de Kurdî jî bê bikaranîn. Ev pêşniyar nehate pejirandin.
- Dersdarên Kurdî yên Zarokistana Pirzimanî ya Beybûnê ya ku Şaredariya Êlihê di 15ê Çiriya Pêşiyê ya 2024an de vekiribû, piştî qeyûm tayînî şaredariyê bû, biryar dan ku bi qayûm re kar nekin. Malbatan jî biryar dan ku zarokên xwe neşînin zarokistanê.
- Parêzereke Baroya Stenbolê, ji ber ku hin parêzeran di koma Whatsappê ya Komîsyona Felsefe û Sosyolojiya Hiqûqê ya Baroyê de bi Kurdî peyam nivîsandine, serî li Baroyê da û

giliyê wan kesên ku bi Kurdî peyam nivîsandine kir. Parêzerê, mijar li ser hesabê xwe yê medyaya civakî ragihand.

**Kanûna Pêşiyê**

- Komeke nîjadperest li navçeya Çanê ya Çanakkaleyê, ji ber li ber stranên Kurdî govendê digerînin êrîşî şahiyeke zewacê ya malbateke Kurd kir. Komê elektrîka cihê şahî lê dibû birî û derb li ciwanekî xist.
- Di dema hevdîtinên budceyê de Parlamentera DEM Partiyê ya Şirnexê Ayşegül Doğan bi Kurdî axivî. Wekîlê Serokê Parlamentoyê yê MHPyî Celal Adan midaxale lê nekir. Lê di zabitnameyan de axavtina Doğanê ya bi Kurdî nehate nivîsîn. Li şûna gotinên bi Kurdî, hate gotin ku “Kesa diaxivî gotinên ne bi Tirkî kirin.”
- Parlamentera DEM Partiyê Zeynep Oduncu dema li Civata Giştî ya Parlamentoyê bi Kurdî axivî, dengê wê hat qutkirin. Oduncuyê di dema axaftina xwe de destpêkê bi Ingilîzî got “Ji şer re na, demildest bila aştî pêk bê.” Paşê heman gotin bi Kurdî got. Lê dema bi Kurdî axivî, Wekîlê Serokê Parlamentoyê yê AKPyî Bekir Bozdağ dengê Oduncuyê qut kir.
- Xwendekarekî ku li Göl Kafeyê ya di destê Rektoriya Zanîngeha Harranê de yr bi Kurdî stran got, hate astengkirin. Dema xwendekar li gîtarê da û dest pê kir bi Kurdî stra, ewlekarên zanîngehê ji rêveberiya kafeyê re gotin bila bi dengê bilind muzîka Tirkî lê bidin. Xwendekar bertek nîşanî vê rewşê da. Ewlekaran gef lê xwar. Xwendekarên dema sedema qedexeya Kurdî pirsîn, ji wan re gotin, “Dema stranên Kurdî tên strîn, pevçûn derdikeve.”

# 3. Binpêkirinên di Medyayê de

## Kanûna Paşiyê

- Dadweriya 2yem a Aştî û Cezayî ya Erzeromê malpera Rojnameya Xwebûnê asteng kir.

### Sibat

- Hesabê JinNewsê yê Xê yê bi Kurdî “@JinnewsKurmanci" hate astengkirin.

### Adar

- Dadweriya 1em a Aştî û Cezayî ya Erzeromê, di 12ê Adarê  Roja Têkoşîna li Dijî Sansurê ya Cîhanî de malpera Ajansa Mezopotamyayê ya bi navê mezopotamyaajansi35.com sansur kir.

### Tîrmeh

- Hesabê JinNewsê yê Xê yê Kurdî hate astengkirin. Beriya niha jî hesabên heman saziyê @JinNewsKurdi, @JinnewsaKurdi, @JinnewsKurmanci û @KurdiJinnews  hatibûn astengkirin. Bi vê biryarê re, cara pêncan e ku hesabên Kurdî yên ajansê tên girtin.
- Dadweriya Aştî û Cezayî ya Gümüşhaneyê malpera Ajansa Mezopotamyayê ya bi navê “mezopotamyaajansi.net” asteng kir.

### Tebax

- Dadweriya Aştî û Cezayî ya Eskişehîrê malpera Ajansa Mezopotamyayê ya bi navê “mezopotamyaajansi38.com”  asteng kir.

## Îlon

- Malpera Rojnameya Xwebûnê hate astengkirin. Li gorî biryara ku Saziya Teknolojiyên Zanyariyan û Ragihandinê (BİK) daye, Dadweriya 5em a Aştî û Cezayî ya Edeneyê biryara qedexeyê daye.

**Kanûna Pêşiyê**

- Li Tirkiyeyê di meha Kanûna Pêşiyê de 120 pirtûk, kovar û rojnameyên bi Kurdî yan jî derbarê Kurdan de hatin qedexekirin. Gelek ji wan ji hêla weşanxaneyên Kurdan ve dihatin çapkirin.
- Li Pêşangeha 8an a Pirtûkan a Amedê, tevî du pirtûkên bi Tirkî, pirtûkeke Weşanxaneya Aramê ya Mahmût Aba ya bi navê "Dildarê Serkeftinê" ya bi Kurdî jî hate komkirin.
- Dadgeha 4an a Aştî û Cezayî ya Amedê romana Rênas Jiyan a bi navê “Kavirên Anarşîst” a bi Kurdî qedexe kir.
- Dadweriya Aştî û Cezayî ya Bedlîsê malpera Ajansa Mezopotamyayê ya bi navê “mezopotamyaajansi40.com”, bi hinceta "parastina ewlehiya netewî û rêgeza civakî“ .asteng kir
- Dadweriya 1em a Aştî û Cezayî ya Kocaeliyê hesabên NuJINHAyê yên Xê qedeke kirin.

# 4. Binpêkirinên li Girtîgehan

## Kanûna Paşiyê

- Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ji bo doza, Aziz Yalçın, xwest ku Hikûmeta Tirkiyeyê derbarê qedexeyên li girtîgehan li pêş Kurdî tên danîn, parastina xwe bike.

### Adar

- Girtiyên li Girtîgeha Tîpa Tyê ya Afyonê dimînin, ragihandin ku rêveberiya girtîgehê nahêle girtî li muzîka Kurdî guhdar bikin. Girtiyan daxuyaniyek weşand û diyar kir ku hûn li stranên Kurdî guhdar dikin û stranên Kurdî venekin. Wan got: “Ev êrîşeke li ser zimanê me ye. Me giliyê rayedaran kir.” Girtyan her weha diyar kir ki dest datînin li ser nameyên bi Kurdî yên ew dişînin an jî ji wan re tên.

- Ji Girtîgeha Tîpa Fyê ya Hejmar 2yê ya Tekîrdagê girtiyên bi navê F. Y., M. R. A. ,F. A., M. M. S. û M.A, serî li IHDyê dan û gotin, pirtûkan kêm didin wan, bi taybet nahêlin pirtûkên bi Kurdî bînin, ji bo wergera wan,, heqê wergêran ji wan dixwazin û nameyên bi Kurdî yên ew dişînin û yên ji wan re tên, nadin.

### Gulan

- A. İkbalê li Girtîgeha Ewlekariya wê Bilind a Kirşehirê bi parêzerê xwe re axivî, diyar kir ku ji malbata wî ti kes li Tirkiyeyê nînin, ti pêwendiya wî bi kesekî re nîne, bi rêya telefonê be jî nikare dengê kesî bibihîze û ji ber bi Kurdî diaxive, rayedar heqaretan lê dikin.
- H. A.ê li heman girtîgehê jî diyar kir ku ji bo pirtûkên bi Kurdî heqê wergerê ji wan dixwazin.

## Tîrmeh

- O. Ç.yê serî li IHDyê da û got ku hevjînê wê yê li Girtîgeha Tîpa Lyê ya Edirneyê dimîne, bi hevalên xwe re li qawişê bi lîstika Kurdî-Tirkî dilîzin, lê ji ber gotinên bi Kurdî li ser qaxizan dinivîsin, lêpirsîn derbarê wan de hatiye vekirin.

- Rêveberiya Girtîgeha Tîpa Lyê ya Erzîngahê di dema hevdîtina vekirî de malbatan neçar dike ku bi Tirkî biaxivin. Bavê girtiyê bi navê Nihat İşnaz, Muzaffer İşnaz got ku dema ew bi kurê xwe re bi Kurdî diaxivî, gardiyanan ji wan re gotiye, “Bi Tirkî biaxivin.” İşnaz gotiye ku ew bi Tirkî nizane. Paşê jî gardiyan û kurê wî nîqaş kirine. Piştî vê nîqaşê, qedexeya hevdîtinê ya mehekê dane Nihat İşnaz.

**Tebax**

- Parêzer Fadil Tay, endamê Komîsyona Mafên Mirovan a Baroya Şirnexê, bi girtiyên Girtîgeha Tîpa Tyê ya Şirnexê re hevdîtin kiriye. Li gorî gotina girtiyan, piştî midûrê girtîgehê guheriye, axaftina bi Kurdî ya bi rêya telefonê ya bi malbatên xwe re dikin, li girtiyan hatiye qedexekirin.
- Rêveberiya Girtîgeha Tîpa Lyê ya Espiyeyê ya Gîresunê dest danî li ser reşbeleka pirtûka bi Kurdî ya mûzîkjenê girtî Erkan Benlî û wergera Kurdî ya pirtûka Yaşar Kemal.
- Dema Medîne Kaymaz bi rêya telefonê bi kurê xwe Bayram Kaymazê li Girtîgeha Tîpa Fyê ya Tekirdağê girtî re bi Kurdî diaxivî, telefona wan hate qutkirin.
- Ji ber ku stranên Kurdî strane û slogan avêtine, cezayê qedexeya hevdîtin û ragihandinê dan 31 girtiyên jin ên Girtîgeha Jinan a Şakranê.
- Ji ber helbest û stranên bi Kurdî yên li lênûskên Enes İlgen û Serdar Başaranê li Girtîgeha Tîpa Tyê ya Bafrayê girtî, 11 roj cezayê zindanîkirina di hicreyan de dane wan.

**Îlon**

- Ji ber ku stranên bi Kurdî strane û govend gerandine, 15 roj cezayê zindanîkirina hicreyan li 15 girtiyên li Girtîgeha Tîpa Tyê ya Êlihê birîn.
- Ji Girtîgeha Tîpa Fyê ya Hejmar 1ê ya Tekîrdaghe E. O. nameyek ji IHDyê re nivîsand û got ku “Gelek weşanên bi Kurdî û Tirkî yên ji derve ji wan re tên şandin, bêyî ku ji bo wan biryara dadgehê ya komkirinê hebe, nadin wan an jî di bin navê ‘kontrolkirinê’ de bi mehan nadin wan.”

## Çiriya Paşiyê

- Li Girtîgeha Kayseriyê Şaban Kaygusuzê ji sedî 90 astengdar e, piştî ku ew xistine hicreya yekkesî bi hefteyekê, dema bi malbata xwe re bi rêya telefonê diaxivî, ji ber axavtina bi Kurdî, telefona wî hate qutkirin.

**Kanûna Pêşiyê**

- Girtiyên li Girtîgeha Ewlekariya Bilind a Sulucaya Edeneyê dimînin diyar kirin ku bi zorê dixwazin li nava devên wan bigerin, bernameyên wan ên komelgehî tên astengkirin û nahêlin di nava xwe de bi Kurdî biaxivin.
- Li Girtîgeha Kirşehîrê ji bo ku ji bilî Tirkî bi zimanekî din xeber bidin, girtî neçar dikin ku daxwaznameyan pêşkêş bikin.

*** Çavkanî:** Daneyên di vê raporê de, ji çavkaniyên ku ji raya giştî re vekirîne, ji nûçeyên medyayê û raporên mehane û salane yên rêxistinên civaka sivîl hatine berhevkirin.